

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (150) Sal 26 12ê Rezbera 2021 z - 2633 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S

# Pirsgirêka welatê me Sûriyê... Çareseriyeke lezgîn dixwaze!





**Desteya sernivîser**

Eve bêtir ji 10 Saln e ku li welatê me Sûriyê qeyraneke dijwar derketiye, bi piflêkirin û têvedana hin dewletên herêmê û hêzên mezin ên cîhanê, her çûye, ew agir berfireh û gur bûye, ter û hişk daye ber xwe, şewitandiye, xaka welêt parçe kiriye û gel perîşan, xizan, baskşikestî û riswa kiriye!

Di encama vî şerê bê wate de ku tu berjewendiya gelê Sûriyê têde nîne, û di bin hin diruşm û saloxanên derewîn de, artêşa dewleta Turkiyê bi alîkariya milîsên tundrew, bermayên Rêxistina Daişê, El Qaîde û çekdarên Îslama radîkal ên girêdayî Hemahenga Sûriyê ve, sê deverên Kurdî li bakurê welêt (Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê) dagîr kiriye, siyaseta Jînosaydê dij gelê Kurd bikar aniye û hê jî bikar tîne, li ber çavên raya giştî, hemû hêz û dewletên cîhanê, bi armanca valakirina wan deveran ji xwediyên wan ên resen, dêmografiya wan diguhêre û bi hovîtiyeke kesnedî xelkên wan talan dike, aşkence û zindan dike, dahtûya wan bi darê zorê ji wan distîne dibe, ji bilî zêdegavî û kuştina mirovan a pilankirî ku jiyan welatiyan .....

2


# Li ser rêya xebat û zanînê... Nimûneyeke balkêş «MIHEMED ÎSO»

**Mihemed Dilî**

Îsal, Xwendekarekî kurd ê bi navê Mihemedê Îso yê bi temenê bêtir ji 60 salî, Pileya BEKELORYA li welatê DANÊMARK (bajarê Skendrborg) stand. Mihemed, ji gundê MEZIN ê – nêzîkî Maratê, Herêma Çiyayê Kurmênc (EFRÎN)ê ye - wek hemû zarokên kurd di wê demê de, wî xwendina xwe ya serete li gundên (Mezin – Gazê – Maratê) bi astengî qedandiye, li bajarê EFRÎN, xwendina xwe berdewam kiriye û sala 1981 an û li SENEWIYA EFRÎNÊ (Feysel Qeddor) Pileya BEKELORIYA ILMÎ standiye. Piştre, du sal peymangeha endezyariyê xwendiye û tevlî kar û xebata avakirinê bûye.

Mihemedê Îso, piştî bidawîkirina erka leşkeriyê diçe welatê Lîbya, li wir di warê xeratiya (necarî) bêtonê û hesinkariyê de bi momaniyeke Bulgarî re dixebite. Dema ew diçe Yonanê, bi dilgermî xwe fêrî zimanê Yonanî dike û îsal Bekalorya Danîmarkî destine û dest bi xwendina Fakulta Rêvebirê Civakî li Zanîngeha Danîmarkê dixwîne.

Bi hêvî me her kurdek li kû be bila bibe, serkeftî be di rêya xwendin û zanînê de serkeftî be. Bila ked û serkeftina kekê Mihemedê Îso pîroz be.



# Serkeftina Taliban Serkeftina terorê û têkçûna aştiyê ye!

**Newafê Bişar**

Piştî 20 salan ji pevçûn û şerê navxweyî, herikandina xwîna mirovan û kuştina bi hizaran ji weltiyên Afxanistanê, û encama rêkeftinekê di navbera Dewleta Emerîka û Rêxistina Taliban de, Emerîkayê hêzên xwe yên leşkerî ji welêt kişandin, careke din, li roja yekşembê 15ê Tebaxa 2021an, piştî heraftina hikûmetê û reva serokomar, çekdarên Talibanê derbasî Kabol bûn, Afxanistan derbasî qonaxeke nû bû, navnîşana wê teror, tarî û hovîtî ye!

Hêjayî gotinê ye ku piştî êrîşên terrorist ên Rêxistina El Qayide 11ê Êlûna 2001an bi serokatiya Usame Bin Ladin ê ku xwe li Afxanstanê veşartibû, û kuştina 2977 kes û karmendên bêsûc û bêguneh, Hevbendiyeke navdewletî li dij terorê bi serperiştiya Emerîka hate demezrandin, di meha Çilleya paşîn a heman salê de, destelata Taliban hate rûxandin.

Ne weke ku hin ji me texmîn dikin ku Afxanstan welatekî hejar û bê semyan û hatin e. Li gora belge û agahiyên Şalyariya Berevanî ya Emerîkayê, Afxanstan welatekî wilo ye ku bi samanên me›denî yên mîna (Lîtyom, Sifir, Zêr, Brîlyom…hwd) dewleteke pir zengîn e ku li ser asta cîhanê pileya duwemîn digre.

Ji ber wê yekê, piştî serkeftina Taliban, dewleta Sînê amedebûna xwe ji bo têkilî û alîkariyê bi Taliban re diyar kir.

Piştî belavbûna vê nûçeyê, grûp û rêxistinên tundrew mîna Ehrar-ElŞam ku bajarê Idlibê ya Sûrî di bin destê wê de ye, şahî û kernevalên keyfê lidar xistin, herweha Rêxistina Îxwan Elmuslimîn û hevalbendên wê geş bûn û di paşerojê de ewê têkiliyên xwe bi hev re ji bo belavkirina terorê saz bikin, ewê bibe jêdera terora



navnetewî. Diyare ku piştî radstkirina Afxanganistanê û serkeftina hêzeke rûreş û tundrew, êrîşên dewleta Turkiyê û hevalbendên wê li dij Rojava zêde bûne, devera Zirganê li Herêma Cizîrê topbaran kirine, di encamê de kuştin û birîndar katine, ji bilî êrîşên hovane bi Drûnan (balefirên bê ajovan) ku bûne egera kuştina hin serkirdeyên HSD.

Bi kurtî be jî mirov dikare bibêje ku serkeftina Talibanê, encama qelsiya Civaka Navnetewî û rêxistinên wê û berzbûna nakokiyên aborî di navbera hêzên mezin ên cîhanê de ye, serkeftina terorê û têkçûna aştiyê ye.

Ji hemû hişmend, zanyar, fîlosof û civaknasên cîhanê tê xwestin ku bi xurtî zengilê metirsiyê bihejînin û hişyariyê bidin karbidestên siyasî da ku ew berjewendiya mezin bidin pêş berjewendiyên demkî yên biçûk! Bila zanibin ku di siha nakokiyên aborî de, teror geş dibe, jîngeh gemar dibe, nirxên mirovatiyê winda dibin, serberdayetî belav dibe, û ben li stuyê gelan teng dube. Berjewendiya gelên cîhanê ser û ber, di aştî û aramiyê de ye, di jiyana demokrasî, pêkvejiyan û mirovheziyê de ye, ne di şer, kuştin û terorê de ye!

21.08.2021

---

**Pirsgirêka... Dûmahîk**

kiriye dojeh!

Herweha, ji hêleke din ve, abora welêt têkçûye, nirxê Lîreya Sûrî li hember pereyên dewletên mezin daketiye, ku bandora xwe bi giranî li jiyana gel kiriye, birçîbûn û nexweşiyên civakî bi firehî belav bûne.

Li ber çavan e, di siha bêdengiya civaka nevnetewî de hin dewlet hene ku ji ber berjewendiyên xwe, naxwazin ev qeyran rêya çareseriyê bibîne, gelê Sûriyê rabe ser piyan û welatê xwe yê wêran ava bike, bi her hawî ew keleman di wê rêyê de diçînin rêkeftinên di vî warî de beravêtî dikin.

Digel ku pirsgirêka Sûriyê bûye pirseke navnetewî, çareseriya wê jî di destê hêzên mezin de ye, lê ev nayê wê wateyê ku gelê Sûriyê û hêz û çarçoveyên wê yên siyasî bê xebat û bê deng li hêviya lihevkirina wan hêzan bimîne, lê belê, ji wan tê xwestin ku ew deng û daxwazên gelê xwe yê birîndar bigihînin raya giştî ya cîhanê, xebata xwe ji bo dîtina çareseriyeke aştiyane ji vê qeyarana wêranker re bête dîtin, da ku gelê Sûriyê jiyaneke azad û bi rûmet bijî. Herweha pêwiste hêzên siyasî li xwe vegerin, kar û hilwestên xwe yên qonaxa borî binirxînin, ji nerînên xwe yên kevin û şoven bidûrkevin, bê dudilî, bi bîr û bawerî ji bo nirxên nûjen, pêkvejiyan, mirovhezî û aştiyê mil li mil kar û xebatê bikin.



# «… Ez dibêjim, berî yekîtî û yekrêziyê, pêwistiya me Kurdan bi armanceke pêvayî heye, armanceke ku pêkan be, ne xewin û xeyal be…»

## Hevpeyvîn bi xebatkarê Kurd Rustemê Mele Şehmo re

***Di nav xebatkarên gelê Kurd ên pêşîn de Rustemê Mele Şehmo, navekî berz û naskirî ye. Wî ne tenê ciwaniya xwe, lêbelê tevahiya temenê xwe ji bo doza gelê xwe terxanidiye, li ser rêya xebatê ya tev rêl û kelem, cefa kişandiye, ji bal dezgehên ewlehiya dewleta Sûriyê ve hatiye binçavkirin, û neçar bûye ku demekê xwe bide alî û xwe veşêre, li gundên Efrînê ew cîwar bûye, lê her wî xebata xwe ya aştiyane şopandiye.***

***Îro, ew mêvanê Weşana NEWROZê ye.***



**Bi navê Weşana NEWROZ, em xêrhatina we dikin û dibêjin gelo tê çawa xwe bi xwendevanên wê bidî naskirin?**

Li destpêkê, ez spasiya desteya NEWROZê dikim ku serdana min kiriye, û di vê hevpeyvînê de, tişta bê bîra min, ezê bi xwendevanên wê re parve bikim.

Li gundê Kotiya/Devera Cizîrê, 21ê Gulana 1938an ez jidayik bûme. Navê bavê min, Mele Şehmo ye, lê di rastiyê de ew ne malayê ola Islamê bû. Di dema Osmaniyan de, wî li Istenbolê xwendiye û di artêşa Osmanî de bûye serbaz. Ew Kurdekî bîrewer û welatparêz bû. Li bajarê Cerablusê bûye Mudîrê Nahiyê, paşê li Munbicê bûye Wekîl. Wî xwe bi gelek navan daye naskirin. Li Cerablusê ew Ruşdî Beg, li Minbicê Reşîd û li Herêma Cizîrê jî mele Şehmo ye. Mesîhiyên Amûdê, pir ji bavê min hez dikirin, ta radeya ku navê wî hilnedidan, jê re «Yabo» digotin. Sala 1932an, bavê min û mirovê mesîhî yê bi navê Mîşêl Dom bi hev re şaredariya Qamişlo avakirine.

**1- Destpêkê, di bin bandora kîjan kesayetiyê de hstên teyên netewî geş bûne û kengî tu tevlî rêza tevgera rêzaniya Kurdî bûye?**

Piştî bavê min, bandora pêşîn ya gorbihuşt Mele Şêxmûsê Mûsê bû ku ew mirovekî Kurdî dilsoz û xemxurê gelê xwe bû. Tê bîra min, li sala 1949an yekem car wî ez bi xwe re birim mala Seydayê Cegerxwîn. Dema wî ez pê dame nasîn û zanî ku ez Kurê Mele Şehmo me, Cegerxwîn pir şad bû, ez hembêz kirim û bi dilgermî pêşwaziya min kir. Di sala 1949an de ez tevlî Partiya Komonist li Sûriyê û Libnanê bûme.

Li 16ê Avdara sala 1961ê ez tevlî tevgera rêzaniya Kurdî bûme, û li Çiriya Paşîn a sala 1963an yekem Koferensê Partiyê beşdar bûme. Konferens li Taxa Xerbî, mala heval Hesen Şêxo»Bavê Rêzan» hate lidarxisin. Ji ber rewşa ewlehiya pir dijwar, gelek heval beşdar nebûn. Ji beşdaran yên navên wan li bîra mine, ev in: «Xalid Meşayix, Kemalê Ebdî Axa, Reşîd Hemo, Ebdelayê Mele Elî, Ezîzê Dawê…û hin din jî hebûn». Di wê konferensê de, me biryara girêdana Kongir di dema 6 mehan de wergirt.

Piştî Konferens, ez û hevalê bi navê Ibrahîm Mihemed Yûsif ji bal dezgeha ewlehiya dewletê ve hatin girtin. Piştî heftakê ji lêkolîn û aşkenciyên hovane yên giran, ez ji zindanê reviyam û ketim nav malan, hema ez ketim malekê bê ku ez zanibim ew mala kê ye! Pişt re min nas kir ku ew mala mirovekî mesîhî bi navê Binyamîn û karê wî berber bû. Tevî ku wî zanîbû ez bazdayî me jî, camêr û kufleta xwe pir rûmeta min girtin. Piştre, min xwe gihande hevalan û ketim siha aramiyê.

Demekê min xwe li Girkê Xelo veşart, paşê li Maşoqê bûme mêvanê Xeco û Sedoyê Elîyê Unis Axa û li gundê Girdêm, bûme mêvanê Sebrîyê Elî yê Ehmed û li Cimayê jî bûme mêvanê Seydayê Mele Remezanê Berzençî…ji ber vê veşartinê, min gelek cefa kişand, rabû hevalan ez şandime Herêma Efrînê.

**2- Di wêdemê de, di sihafişar û sitema destelatên nijadperest de, ku tenê nivîsandina bi zimanê Kurdî sûc û gunehkariyeke mezin bû, we çawa xebata xwe di nav gel de berdewam dikir, çi astengî li pêş we derdiketin?**

Belê… Ji ber sedemên rijêma şoven û karbidestên wê yên zikreş û kêmbûna xwendin û zanînê, pir rêl û kelem li pêşiya xebata me derketine, Perîşanî, belengazî û destengiyê, rê li pêş xebata me teng dikir û neduhişt em armancên xwe bicih bînin. Lê tevî wê jî, gelê me em diparastin, rêz û rûmeta me digirt û bi çavên têkoşeran li me temaşe dikir. Vê yekê, dilê me bi xebatê .....

4

**Hevpeyvîn... Dûmahîk**

xweş dikir hêviyên me geş dikir û ji bo berdewamiyê, hêz û hiner dida me.

**3- Rola tevgera rêzanî ya Kurdî li civakê hebû, ango Kurd li tevgera xwe xwedî derdiketin?**

Wê demê, Rojnameya Partiyê bi zimanê Kurdî bû. Me ew ji dost û hevalên xwe re dixwend û naveroka wê şirove dikir, bi vê yekê, girêdana wan hem bi zimanê Kurdî û hem jî bi doza wan re xurt dibû.

**4- Ji kerema xwe, li ser kar û xebata wê demê, tu çi dikarî ji xwendevanan re bibêjî, da ku ew sûdeyê ji ezmûna we bigrin?**

Bi rastî, me gelek cefa kişandiye, em westiya ne. Dibe ku me armancê gelê xwe bicih neanîbe, lê li gora derfet û karîna xwe, bê dudilî em xebitîne, bi hêvî ne ku nifşê me yê nû, sûdê ji şaşiyên me bigre, li ser ava bike û pêşve here.

**5- Ji wê qonaxa ebatê, çi bîranînên ku nayên jibîrkirin di hişê te de mane, tu dikarî çi bibêjî?**

Dema ku ez li Çiyayê Kurmênc bazdayî bûm, li mala birêz Bilalê Elî bûbûm mêvan ku tenê xaniyekî wanî cuda hebû. Kal û pîrek bûn, hejar û belengaz bûn. Tê bîra min, gelek caran xwarina me nan û dew bû, me hersiyan bi yek kevçiyê darî(Çemçika darî) dew vedixwar, ji ber ku ji wî kevçiyê pê ve di malê de tune bû!. Ta sax bim, ev ji bîra min naçe!

Careke din jî, rojekê li Çiyayê Kurmênc şarwalekî Helebiyan li min e, pora min gijolî û riha min dirêj e, cil û kincên min gemarî ne, li gundê Kotana ez çûme ser bîrê da ku avê vexum. Dema ez nêzîk bûm, keçekê dewla xwe li şûn xwe hişt û reviya çû malê, ji maliyan re gotibû: Mirovekî bodele»dîn» hatiye ser bîrê, ez jê tirsiyam! Derket ku ew keç, xuha hevalekî me bû!

**6- Çi bîranînên te bi xebatkar û serkirdeyên Partiyê yên mîna Dr. Nûredîn Zaza, Apo Osman Sebrî, Hemîd Derewîş, Reşîd Hemo …û yên din re hene?**

Tê bîra min, Reşîd Hemo Korsên zimanê Kurdî û zanyariya siyasî dida hevalan. Bi rastî, ew hevalekî zana û bîrewer bû. Herweha min Apo Osman Sebrî jî dîtibû, ew bi mêrxasiya xwe navdar bû û çavên wî nedişkestin. Dr. Nûredîn Zaza, xwediyê hişê mezin û vekirî bû, di siyasetê de realist bû, baweriya wî bi diruşmên mezin nedihat. Di hilbijartinên Parlementoyê de, ez wekîlê wî û Şêx Mihemed Îsa bûm.

**7- Di nerîna we de, gelo sedemên perçebûna tevgera rêzanî ya Kurdî çi bûn? Gelo, Raste ew di warê cudahiya raman û hilwesta siyasî de bûn?**

Na…Sedemên Perçebûna tevgerê ne ramanî û ne jî siyasî bûn! Ew di naveroka xwe de, ezîtî û rêxistinî bûn. Bi kurtî ez dikarim bêjim ku diruşmên me, ji imkanên me mestir bûn, ev jî dibû sedema ku em biser nekevin, nakokî di nav me de serî hildin.

**8- Li gora ezmûna we yadirêj, gelo tu rewşa tevgera Siyasî ya Kurdî Li Sûriyê çawa dinirxînî, û sedemên rewşa me ya xirb çine û derman çiye mamoste?**

Ez dibêjim, berî yekîtî û yekrêziyê, pêwistiya me Kurdan bi armanceke pêvayî heye, armanceke ku pêkan be, ne xewin û xeyal be. Ango em karibin armancekê piçûk be jî bicih bînin, ji sed saloxanên mezin çêtir e, û pêwiste welatparêziya me, li pêş berjewendî û partiyetiyê be.

**9- Îro ji bo yekrêziya tevgerê xebatek heye, ew xebat jî di çarçewa lihevanîna PYNK û ENKSê de ye…Hin partiyên xwedî rol û dîrok û saziyên civaka sivîl jive xebatê tên bidûrxistin. Ma gelo pêwistiya gelê me bi lihevkirineke giştîtune ye? Tuçidibêjî?**

Di nerîna min de, ev pirs bi ya berî xwe ve girêdayî ye. Her ez ne reşbîn im, lê, yekrêzî armanceke pîroz e, gereke tu alî jê neyên dûrkirin, ji ber ku ev kar, ustubarê me hemiyan e, ne yê aliyekî yan du aliyan e, û hemû mafdar in ku beşdariyê di gengeşeya çarenûsa gel û welatê xwe de bikin.

Bi herhawî, hêviya serkeftinê ji vê xebatê re dikim.

**10- Li dawiyê, tu dixwazî çi ji gel, tevgera Kurdî û ciwanên Kurd re bibêjî?**

Ez ji nifşê me yê nû hêvî dikim ku ew bi hişmendî xebatê bikin, têkiliyên dostane bi hemû pêkhateyên welêt re li ser bingeha berjewendiyên hevbeş saz bikin û dadmendiya doza xwe bi wan bidin naskirin û xeleka dostan jê re fireh bikin. Guh nedin saloxan û diruşmên mezin ku ta roja îro em ketiyên wan in!

Berî ez vê hevpeyvînê bidawî bînim, dixwazim bêjim ku gorbihuşt Hemîd Derwîş, serkirdeyekî Kurdî zîrek bû, xwediyê taybetmendiyên cuda bû. Ew kesekî xwedî ceger, merd, nefisbiçûk û hevalê hevalê xwe bû… Mixabin ku li dawiyê ez derheqa wî şaş çûme, gereke min ew şaşîtî nekiriba! Herweha, gorbihuşt Ezîz Dawê, di zanîna xwe de hevalekî kûr û jêhatî bû. Cihê wan û xebatkarên Kurd ên dilsoz bihuşt be.

Li dawiyê…Spasiya we dikim, ev guhdana we û xwedîderketin li keda û cefa mezinan, cihê rêz û rûmetê ye. Bila Newroz her geş be, ji bo doza gel alaveke rast û saxlem be, ji karmend û xwendevanên wê re silavên germ.

**NEWROZ, hêviya temenekî dirêj û jiyaneke xweş ji te re dike.**

29.06.2021an

# ÎRO BERÎ SIBA XELKÊ ME YÊN KOCBERBÛYÎ DIXWAZIN VEGERIN EFRÎNÊ

**Memê Alan**



Pêşgotinek girîng: Berî kirîza Sûriyê hejmara nişteciyên Herêma Efrînê dora /700/hezar nişte bû, jê /96%/ nişteciyên Kurd ên resen bûn, û yên mayîn jî ji pêkhateya Ereb bûn, di karnava kirîzê de, dora /50%/ ji ber rewşa aborî û ewlehiyê jê bi derketin û berê xwe dan welatên biyaniyê, û dora /350/hezar nişte di Efrînê de man. Lê, di navêna ku Artêşa Turkiyê bi hevaltiya Milîseyên Sûrî yên nandoz êrişî herêmê kirine û ta ku dagîrkirine de, piraniya xelkê ji neçarî û ji tirsa li ser jiyana xwe re ji herêmê derketin, paşê beşek ji nû ve vegerî cî û warên xwe, yên din jî hin jê derbas Heleb bûn û beşek li Herêma Şehba›i - Bakurê Heleb ma, û hejmarek biçûk jî ji bo kar û peydakirina pariyê nên berê xwe dan Ewropa, Kurdistana Başûr, Kobaniyê, Cezîrê û hin deverên din, yanê em kanin bibêjin ku serjimarên ku niha li ber destan hene bi vî awayî ne:

Dora /120/ hezar niştecî li herêmê dimînin, dora /220/ hezaran jî li gund û bajarokên Şêrewa û Şehba›i in. Lê, xem û qisaweta hemiyan a yekem vegera li cî û warên bav û bavpîran e, ne mandina li wan warmişextan e.

Li hundir Efrînê rewş ji hemî aliyan ve pir zor e, jiyana xelkê me kêlî bi kêlî di bin gefê de ye, û kuştina hemwelatiyê bêsûc «Ridwan Rehîm ê pêncîsalî» li vê dawiyê jî nimûne ye. Li herêmên penaberiyê jî rewş û jiyana xelkê me bi rengekî din di nebaşî û metirsîdariyê de ye, ji alîkî ve zext û hestên dûrîtiyê ji welêt, tunebûn û metrisiya topbarandinên Artêşa Turkiyê û nandozên wê yên herwext ku bi ser wan de dibarin. Li alîkî din doseya Sûriyê bi tevtahî ji aliyê dewletên destêwerdankirî ve hatiye sarkirin, û asoya tu çareserkirinê ne diyar e. Li rex vê tabloya tarî û pêşeroja ne diyar, em Kurd jî ne yekhelwest in, em behs û rikan bi hev re dikşînin û dixwazin hevdu tune bikin, û ji qerez hev re pêşeroja miletê xwe têkin bazarên erzan, da ku cilê ji bin hevdu bikşînin, weke çawa li vê dawiyê daxuyanên bi navê «serhiladana vegerê» yên ku ji aliyê «ENKS» û alîgirên wê ve têne der, bê ku tu amedekarî û gerantî ji vegerê re hebe, û tenê ji bo tazîkirina Rêvebiriya Xweser a li Şehbayê, herweha Rêvebiriya Xweser jî, ji bo rawestandina wê kampaniyê, bi rengekî din dikeve çewtiyan, li hember ê dixwaze here disekine, yên diçin bi ketina hembêza dijmin û hin caran bi îxanetê tewanbar dike, û dibêje neçin ta ku em Efrînê rizgar dikin û bi hev re bi rûmet û enîhilmiştî derin. Vêca miletê me di nav van kişandina virdewêve de hinda bûye, her dere bêhêvî dibe, û baweriya wî bi Partiyên Tevgerê lawaz namîne.

Di vê çarçewê de, em dixwazin li ser hin xalan tekez bikin:

1- Em bawerin ku xelkê me bi axa xwe ve girêdayî û di zûtirîn dem de dixwaze vegeriyê.

2- Mafê vegerê mafekî kesayetî ye, û hemî rewayên asîmanî û zagonên danîndayî wê tekez dikin.

3- Em bi yek nêrîn li xelkê xwe yên li hundir Efrînê û yên li derve binêrin, ta ku ji me were, em piştgiriya tevan bikin, çimkî herdu alî û her yek bi rengekî ji bo hebûna vî gelî li ber xwe dide.

4- Mijara vegera xelkê me mijareke girêkok e, û ne bi wê hêsaniyê ye, çimkî bi pir aliyan ve girêdayî ye, û xebateke bêhempa û bi hev re jê re gerek e.

5- Hemî aliyên di kirîza Sûriyê de têkildar, û bi taybetî yên herêmî naxwazin xelkê me vegere, û yên navdewletî jî li berjewendiyên xwe digerin.

6- Pirsgirêka vegerê bi vegerandina çend kes û malbatan çareser nabe, çimkî ew bi vegera sedhezaran hemwelatiyên me ve girêdayî ye.

7- Ji bo çareserkirina pirsgirêkê xebateke li ser pir astan gerek e (Kurdî, Sûrî, Kurdistanî, herêmî, navdewletî).

8- Hemî aliyên Kurd vê mijarê nexin bazarên siyasî û bejewendiyên partîtî yên teng.

9- Em tev bi hev re, bi mejiyekî komelane li çareseriya vegera xelkê xwe bigerin, belkî em kanibin bi ziyaneke hindik xelkê xwe vegerînin, û siyasetên dijminan ên qirêj ji ser xwe bidin alî.

# PÊDIVIYA GOT Û BÊJA KURDÎ...

**Mehfûzê mele silêman**



Ji bo avakirin û amadekirina hoyê xweser li hember ûştê derveder yê peydebûyî, hevrêzkirin û yekkirina mala kurdî di her deman û cihan de, û di her doxan û rewşan de gereke û pêwîst e.

Çimkî nakokî, milmilanî û parçebûn yên navxweyî her dem sedemê sereke bûn di hilweşandina raperîn û şewreşên kurdan de, û di têkçûna hewildanên wan de, û beravêtîkirina hêz û şiyanên wan de, û windakirina hemî derfetên guncav di qûnaxên dîrokî yên bûrî de, li akamê şekestin û ziyan werdigirtin, û di vê bar û mijarê de pir ezmûn û serpêhatiyê kurdan yên reş û tehl hene.

Her dem dijminên kurdan di çespandina binyada mihtinkar «ji hev cuda bike tê serdest bî» di nav kurdan de biserdiketin, û ji bo pirojeyên xwe yên dagîrkirinê baş bikartanîn û nedihiştin kurd aza bibin û qada xwe rizgar bikin û serxwebûnê pêk bînin.

Bûyeran û serpêhatiyan tekez kiriye, ku alîyekî kurdî çiqasî bi hêz û rêz be tu carî zora alîyekî din nebiriye, û nikariye hebûn û rola wî tune bike,lewre pênasîna bi kesê din yê hevrik û dijber pêwîst e, û dive bi hev re ser mêza got û bêjê rûnin, da pirsgirêkan û nakokîyan di nav xwe de çareser bikin, da ku mezin nebin, ji bo doza netewî ya giştî û hevbeş, ku bervaniye di ber hebûn, nasname û mafan de, dûrî berjewendiyê kesayetî, malbatî, hozîtî û partîtî.., di rêya hevgihiştin, rêkeftin, hevparî û hevgirtinê de.

Bi mercê ku hemî alî sûdê jê bigirin, û tu kes neşikestî û neserkevtî be, bi tenê ji bo berjewendiyên netewî û niştîmanî be.

Her wiha bi taybet derbarê rojavayê kurdistanê (kurdistana sûrî) nemaze di hundirê van rewş û doxên heyî de, ku ji encamê qeyrana sûrî ya dûvdirêj û li hev gelicî, û berhemên wê yê wêranker û bobelat, pişt bûrîna 10 salan ji destpêkirina şerkirin, wêrankirin û talankirinê.. ku hişt doza kurdî giring û balkêş be di rojeva bûyera herkatî de û di nav raya giştî û çêkerê biryara navdewletî de, û pelika giran û tezûdar be di danîna siyasta hindur û derve ji hemî dewletên herêmê re, nemaze dabeşkarê kurdistanê..

Tiştê pêkhatî ji destkeftên netewî (rêvebiriya xweser) ser zemînê bi buhayê lehengiyan û qurbaniyan di kaxên berxwedan û berevaniyê de di ber gel û welat de, dijî hêzên tariyê û tûndrew, ku di serî de DAIŞ (ISIS) bi alîkarî û piştgiriya bira, dost û hevbendan.

Ev rêvebiriya ku bû nimûne, endaz û rêber ji bo danîna nexşa siyasî ya nû ji dewlet û rêjîman re li ser asta navxweyî û herêmî.

Da ku ev destkevt bên parastin û di destûra sûriya nû de ragîrbin û bi cî û xayan bibin, divê kurd yekrêz bin û yek gotar bin, ku her gav û her dem daxwazên netewî û niştîmanî ne, li ser Asta fermî û gelêrî wekû armancên tektîkî û sitratîcî di rêya bangan û destpêşxeriyan re yên li dûhev û yekser ji bal gelek aliyên kurdî û kurdistanî ve, yên ku li dawîyê ya Ceneral Mezlûm Ebdê bergirt û ket rojevê de bi bizav û piştgiriya dost û hevbendan, û biçavdêrî û serperştiya dewleta Emrîka (USA), ku got û bêj gavin mazin bipêş de çûwe, digel ku hin terpilandin û rêgirî di pêşiya wê derdikevin, lê divê di wan derbas bibe.

Li vir jî hêja ye amaje bi hewildanên serokatiya herêma kurdistana Îraqê bibe, ku levkirinên Hewlêr 1 û 2 û dihok encamdan, lê bidaxewa jê vegiryan û pêbendî navrokê wan nebûn û bi cî nekirin.

Bi diyarbûna nîşanê bidawîbûna qeyrana sûrî ku ber bi çareseriyê diçe, û nêzî qunaxa encamdana dibe, li pêşiya kurdan du bijarde hene, yan

Yan wê rijdbin li ser cudabûn, nakokî û milmilaniyê, û paşî windakirina derfeteke zêrîn, û dubare kirina dîrokê bi derd û azarê xwe, yan jî wê li hiş û bextê xwe vegerin û got û bêja bi dawîbikin, û rêkeftineke levhatî û bi ser û ber pêkbînin, û lêvegereke kurdî giştî û dirust ava bikin, da rêvebiriya têkoşina kurdan bike, û hêz û qurbaniyan bikar bîne, û mafê kurdan yên rewa bi dest bixe, li gorî şiyan û karînên kurdan, û li barê hevsengî û berjewendiyên zilhêzan.

13.3.2021an

## Yilmaz Guney ji bîr nabe



**Yilmaz Guney ji bîr nabe Roja 09.09.2021an salvegera 37 emîn ya koçbarkirina sînemekar û hunermendê dengdar Yilmaz Guney (Yılmaz Putun) bû.**

**Guney sala 1937an li gundê Yenîceyê, bajarê Edenê-Turkiyê ji dayik bûye.**

**Dibistana seretayî û ya navîn li Edenê xwend, û li Anqerê zanîngeha Mafan û li Stenbolê jî beşa aborî xwend.**


**Di ber xwendina xwe re çîrok û sînariyo dinivîsandin, pirtir li ser êş û derdê gelê xwe yê Kurd radiwestî.**

**Ji ber kar xwe yê rewşenbîrî û siyasî rastî girtin, zîndankirin û cezaya hat, ta sala 1981 an, ji zîndanê revî û çû Ewropa.**

**Wî bi dehan fîlm amadekirin û di dehan de jî roldar bû, û li ser fîlmê xwe "YOL" Palmiyeya Zêrîn yan mehrecana "KAN" sala 1982an wergirt.**

**Guney, li Fransa koça dawî kir, û di gorîstan mezinan de li Parîsê hate veşartin.**

# Efrîn, û pêşeroja nediyar



**Nazdar Hesen**

Herêma Efrînê herêma kurdî ya ku, berî dagirkirina wê ji aliyê dewleta Turk û çeteyên pê ve girêdayî, rêjeya Kurdan ji sedî nod û pêncbû û erebên li wir dijîn di toreya wê civakê de hatibûn stiran, çi ji aliyê cilûbergan ve û çi ji aliyê dayîn û standinan ve, piraniya wan bi zar û zimanê kurdî dizanîn û baş pê daxivîn, cîrantî û hevaltiya wan baş bûn û hemû bi hev re di rewşek aram û ewle de dijîn. Lê niha û piştî derbasbûna sê -çar salan ji dagirkirina wê, herêma Efrînê ne maye herêmek kurdî û ne jî maye herêmek Sûrî!

Çima ne maye herêmek kurdî?

Ji ber ku, rêjeya Kurdan li wir ji sedî nod û pênc daketiye pîst û pêncan û ger niha tu li kolanên wê bigerî kolanên Kelasê û Şe›er ên bajarê Helebê tînin bîra mirov, jinan hemiyan cilbabên reş li xwe kirine û tenê qulên çavan têne xuya kirin, mêrên rih dirêj û bi gelabî û çek li ser maturan li vir û wir digerin û zarokên wan di gulîstan û kolanên wê de bi serbest û azad dilîzin û pir kêm tu yê rastî yekî kurd û bi kurdî daxive werî.

Û çima ne maye herêmek Sûrî?

Ji ber ku , nasnameya Sûrî roj bi roj tê rakirin , guhartina nasnameya Sûrî bi ya turkî, hildana ala turkî û wêneya Serokomara Turkiyê, guhartin û nivîsandina navnîşanên qad, kolan, dibistan, nexweşxaneyan bi zimanê turkî û ta saetên avê û êliktirîkê bi ya Turkî hatiye guhartin, kirîn û firotin bi pereyên turkî û rêbaza xwendinê tev hatiye guhartin û bi zimanê turkî tê fêrkirin û ev hemû binpêkirin ji serweriya dewleta Sûriyê re ye, û pêkanîna hemû kiryarên hov û kirêt ên dewleta Turk bi rêya çeteyên xwe di dermafê Efrîniyan de dikin ji bo guhartina demografî ya rêbazkirî were bi cî kirin û Efrîn nemîne herêmek kurdî sûrî.

Belê Efrîn di van sê -çar salên derbasbûyî de ser û ber hatiye guhartin û nasnameya turkî lê hatiye ferzkirin lê kêşe û pirs tenê ne ew e, pirsa giring ew e: Ka piştî ewqas guhartin wê pêşeroja Efrînê çi be? Efrîn wê rojekê vegere herêmek kurdî sûrî an wê bibe herêmek turkî?!

# Zengil û pisîk

**Zanistê comê**

Wek tê zanîn li seranserî cîhanê hemu dezgeh mînak encûmen, partî, komel e û enî di nav gelan de tên avakirin bona karekî bikin. Vêca her yek ji wan li gor berjiwandiya gelê xwe, tozik û azîna xwe dinivsînin û karê xwe dikin, ku armanc û daxwazên gel pêk bînin.

Kirîza Sûriyê derbasî sala yazdan bû û hîn berdewame, ta niha ne diyare û ne naskiriye ku berê sûriyê kuve diçe ta destlata Sûriyê yê fermî nizanê û ne kanê xwe û gelê xwe ji bataqa ku bi xwînê hatî misdan derxîne. Vêca li beramberî wê dagîrkirina Efrînê bi destê çeteyan û alîgiriyên destlata Turkiyê jî derbasî salsa çermîn dibe û hew jî ne diyare wê li kîjan kenarê raweste.

Kesên rewşa Kurdan û tevgera wê ya netewî dişopandin, baş dizanîn ku partiyên sereke li çiyayê kurmênc yên xwedî rol û camawerekî wan di nav gel de hebûn ev bûn: Pyd, Yekîtî, Elpartî û pêşverû bûn. Nayê wetayê ku ez dibêjim partyiyên din yan kesên welatparêz yên serbixwe tune bûn. Lê mebesta min ji vê yekê ew e ku piştî dagîrkirin û talankirina Efrînê û penaberiya nişteciyên wê çi li şehba û çi jî li deverin din.

Vêca pirs ewe gelo kar û barê ew partiyên sereke yên me bi navkirine bi dagîrkirina Efrînê re radiweste û kuta dibe yan destpê dibe.!

Kêm zêde ta niha endamê hemu partiyên me bi nav kirine li gundewarên çiyayê kurmêc hene, lê mixwebin wek ez dizanim tu partî karê xwe yê rêxistinî dike tune ne û ne navendên wan diyar in. yek ji wan partiyan partiya yekîtî ye, vêca ez tekez dikim li gor tabloya hebûn û belavkirina hevalên partiya yekîtî li kurdaxê sedî 6570- ji hevalan di gund û bajarên xwe de dijîn û her wiha partiyên din jî.

Wek tê zanîn û naskirin hemu dezgehên me li jor bi navkirine, bi dagîrkirina Efrînê re karê wan hat rewastandin û hemu endamên sereke û berpirsiyar pişta xwe dan Efrînê û her yekî li gor berjiwendiya xwe ne li gor ya gel yan li gor yên hevalên xwe bi derekê de şiqitîne!

Vêca berxwedana dagîrkeriyê ji kê re hîştin û sûnda wan ku sûndxwarine li ku ma, nizanim, zengil wiha bi sutiyê pisîkan nakeve, û mişk nayên girtin.

Girîng û pêwîste ew partî li xelkê xwe xwedî derkevin û piştgiriya wan di hemu war an de bikin.

# Avê di solên hev de vexwin!

Mihemed Qere Hesen

Rojekê du bira bi hev re rêwîdar bûn, di beyabûnê de pir meşîn û tîna royê ew diqjiland û ji tîna re hemahema dê bifetisîna, gihêştin ser devê çalekê. Diramîn ku dê çawa avê ji çalê vexwin. Birayê mezin bi yê çûk re dibêje: Keko ezê bi çeplên te bigirim û berdim çalê û tu yê sola xwe bi avê xînî û vexwî. Lê birayê biçûk bi yê mezina re digot: Na keko tu yê sola xwe bidî min û ezê bi avê xînim û vexwim. Û gava min têr vexwir noba din tu yê jî wiha bikî. Wiha hişê herdu biran çûn ser hev û xwe ji tîna fetisandinê rizgar kirin.

Raman ji vê kurte çêrokê ew e ku gav meriv çi bira bin an jî dost bin, ji hev hez bikin, ger alav û amor çi be jî, ne girêk e, ya giring ew e ku hevdu ji mirinê rizgar bikin. Bi gotinek din jiyana yekî jiyana yê din e, û mirin jî wiha ye.

Em tev dizanin ku rewşa doza Kurd li Sûriyê gihêştiye firk û çatrêya nû parî ketiye gewriyê, yê wê were lûpkirin an velûkirin. Neyarên gelê Kurd çi li hundir û çi jî li derve bi şev û roj kar dikin û pilanan digerînin ku vî parî ji gewriya Kurdan bi derxînin û vegerînin berî tevgera gelê sûrî bi deh salan. Û van destkewtên di van salên borî de ji me bistînin, ta ev parî netê velûkirin çi jê re divê.

# Gava herî serek e, ji Kurdan re ew e ku gelş û nakokên xwe di rêya hevpeyvîn û diyelogê re çareser bikin û van daneserên ragihandinê li dijî hev a ku gelê Kurd dabeş dike rawestînin. Cilê ji bin ling û lîskên neyarên xwe bikişînin û bihanên êrişkirina dewleta Turk, rijîma pirçê û hiş reş (Îranê), Rûs û rijîma Sûrî ya pirçaskî derxînin. Guftûgo hemî tiştan ji hev re aşkere dikin, û hemî aliî haj hev û kirên neyaran hebin û bi hev re bergirya pilanên wan bikin û karsaziyek hevpişk di navbera xwe de ava bikin, ev rê li ber yekîtiyekê di her beşekî de çê û dûz dike, fişar û destêwerdana aliyên kurdî ji beşên din ên Kurdistanê re rakin û têklî bibe wekhev û dademend.

Guftûgo li ser nêta hişmendiyê û lihevkirinê be û li ser mijarên herî pêwîst bin. Êrişên kurên gurê gewr (Turkiyê) bi îjdilî biveyên wan bibin û hebûnê Qendîlê biramin, ji ber ku her du rojan daneserên leşkerî nebin ser bakûrê Kurdistanê ta ku tebatî û hêmenî nemîne. Divê kurtikê Osmên bi şêwekî di rêya guftûgoyê re were çareserkirin û dev ji hêzên gerîla netê berdan. Di roja îro de pêwîstek mezin heye ku Gerîla bi hukmeta barşûrê Kurdistanê re girêbestek îstiratîcîk çêbikin, girêbest ne bi partiyan re be, ji ber ku hêza leşkerî dibin fermana hukmeta kurdistanê de ye.

Mera pir bawer e ku Kurdan rast û çepiya xwe ji hev nas kirine, û ew di golek e ji berjewendiyên dewletên herêmê û yên mezin de dixebitin. Ji ber ku îro doza kurd li seranser ji qonaxek dîrok derbas yek din dibe, ger şaş bûn, kêmasî çêbibin û bi hev re ne karsaz bin, wê ziyaneke mezen bi Kurdan gihîne.

#Şêweyê têkliyan di nav tevgera konevanî kurdî de were guhartin.

1- Têkliya hukmeta herêma başûr û rêvebirya xweser li rohilatî Ferêt li ser binghên dewletê li ser berjewendiyên hevpişk werin avakirin, ji ber ku têkliyên dewletan û partiyan ne wek hev in, berjewendiyên hukmeta başûr û xweserê pê radibin wek alîkî cibicikirinê û bi rêvebirinê ne, ji ber vê, divê herdu alî ji bin baskên patîtiyê bi dûrkevin, û serê xwe nekin nakokî û gizgizên partiyan, ji ber ku partî nêrînên xwe başqe ne, partî xwedî bîrdoz û berjewendiyên kesane têde tên dîtin, lê karê hukmetan cîbcîkirina berjewendiyên hevsêyan di rêyên zagonê re bi rêve dibin.

2- Têkliyên partiyan piraniyên xwe tiyorî û konevanî ne û nêrînan dirêsin û ne li ser bingehên xizmetgozariya welêt di hemî aliyan de rojane radibe. Û li rex deslata cîbcîkirinê radiwestin û piştgiriya wan dikin. Divê karê hukmetê û partiyan ji hev cuda bin û tev hev nebin, her alîk ji yê din re layangir û karsaz be.

3- Partî rêxistine ne dezgeh û sazî ne, pir caran kes û partî li saziyên dewletê siwar dibin û dikin bin hakarî û rola xwe ya partîtî û kesane, û wek hesp ji xwe re pê kar û nakokiyê dikin, û dixwazin bîrdozê di serê dewletê kin ji kar û barê wê ya rast ê sazyane biyan din û kurmê gendeliyê, celqbûnê û sûdên hindik dikeve bejna dewletê û dibin deslatên zordar.

4- Tevgera kurdî li her parçekî Kurdistanê kanibin ji hev re daxin, û ji porjeyên partîtî di başên din de û bi tevgera kurdî re di wî beşî li karzas bixin û ne di ser vîn û daxwezên û rêzgirtina wan re be. Ji hev re daxistin yek ji mercên dilsozî bi dozê re ye. Gava şaşiyan li serê hev mezin nekin, û ji hev re têbîn û rexnên avakirinê bibêjin û bipejrînin, ew dibe gavek li ser rêya rast, û ger ava gemirî di solên hev de vexwin ji hingivê di zerkên zêrîn ên neyarê gelê xwe de vexwin xweş û çêtir e.

Ji hemiyan ve nas e ku serketina beşekî Kurditanê serketinek moralî ji yên din re ye, û «tirî li tirî dinêre reş dibe» û wê hîngê kurd li kurd dinêre şiyar dibe û bihna wî ji xebatê re fereh dibe.

Rast birame, aşkere û dirust denke, îjdil hez bike

27.07.2021an



# Korona bêhna bayê mirinê.

M.Emîn Sadûn

Dema ez di kolan, sikak û celdên Dêrika Hemko re diçim û têm, û li ser rêyên gundewarê wê digerim. Çavên min bi sihika dost, heval û hogirên min ên koçkirî dikeve. Ez li peyî wê sihikê dikevim ta roj diçe ava. Ne ez sihikê digirim û ne jê li ser şûn û şopa wê diwestim. Roj wenda dibe û pêre sihik jî xwe ji min didize, enîşkê li xwe badide û xwe di tariyê de vedişêre. Lê, beza min li dûv sihikê nasekine û kela dilê min sar nabe û laşê min ê bawîbûyî, naqerime.


Her sibeh ez û sihik û rojê bi hev re hişyar dibin û li hev digerin. Dema roj kirasê şevê li xwe dike, sihik jî di quncikên reşiyê de bi tena xwe û wek sêwîyekî zikbirçî radize. Lê, cardî hewldanên min ranawestin, ez hewldanan dikim ku, sihikê bigirim, li tenişta wê rûnim û çend pisan jê bikim; bîranînên rojên xweş û ciwan, û xwenên şevan li bîra hev bînin û nexşerêya wan xwenan li ber xwe deyînin û bi hev re xet û xêzên wê, gengeşe û nîqaş bikin, xewinên razayî û hêviyên bazdayî bi heve girê bidin.

Derê rikeha xewinan li piştî vekin, û hûr û dûr li firandina wan binêrin û li ser pişta baskên wan asoyên hêviyan birêsin û li ser pilana wan, nexşê tevna omîdan bihûnin! Lê, tevî wan hewldanên gerim û gur, ew hewldan sernakevin û di nava kêferata roj û şevê de bertavêjin, berî dema xwe kulîlkên dara xwe diwerînin û berhem nagirin.

Çemê mandîbûnê di buhareke virnî de radibe û wan xewin û hêviyan li ber xwe dimale û di deryayeke kûr de werdike û ji gera li ser şopa sihikê diqerim û bê hêvî dikevim û disekinim. Hingî bêhna bayê mirinê li min dide û ez bêrîya wê dikim û bêhna dûkela wê jî li ber bêvila min difûre û pêre dilê min diqurmiçe û qemûşkên nêmgirtî ji nû ve vedibin. Birîna kul careke dî dize û serkaniyên çavên şil dîsa derdibin, rondik û hêstirên xav û şor di ser dêmên zikbel de xwe berdidin, çemên rondika tevlî dûkela mirinê dibe û ewrekî reş û tarî di kevanên kinarên dil de hevdigire û xunava xeman di ser dilê birîndar de dibarînin û bîrîkirina mirinê di kaniya dil de dikelîne.

# Civîna Astana… Sapê vê Tene !

Ibrehîm Şitlo



Daxuyaniya dawîn a civîna Astana, diyar dike ku dewletên li vê civînê beşdar bûne : Rûsya, Tirkiyê û Iran xwe ji ber Rewşa Welatê Sûriyê Berpirsiyar dibînin. Lê her yek ji wan hersiyan li gora Bercewendî û Armancên xwe Daxuyanîya vê Civînê cih bi cih tîne.

Her sê dewlet : Rusya, Tirkiye û Iran di daxuyaniyê de daxwaz û Armancên xwe bê Şermî dibêjin û ronak dikin :

„ji serwerî û yekparçeyiya Axa Komara Sûriya dilxwaz in, û ku ew li hev dikin ku li dijî her hewlê dabeşkirina Axa Sûriyê an bi hinceta cenga dijî terorê herêmek ji Sûriyê veqetînin. »

Her wiha jî di daxuyaniyê de Nûnerên hersê dewletan gotin :

„Ewlehî û aramiya demdirêj li herêmê tenê li ser bingeha parastina serwerî û yekparçeyiya xaka Sûriyê dikane were sazkirin ku armanc ew e ku ew Bûyerên ku weke rastîyek bi zorê li ser axa Sûriyê cih bicih bûne, ne Fermîne, di nav de yên derbarê xwe-rêveberiyê de bi hinceta şerê terorê, ev bûyer nayên qebûl kirin."

Em jî di di dîroka Têkoşîna Milletê Kurd de baş zanin ku çawa Kurda li Başûr ala mafê xwe hildidan, dagirkerên li Baxdadê bi slogana parastina yekîtiya xaka Iraqê êrişên hovane dibirin ser me.

Tenha bi wê tenê jî nedikrin, diçûn parsa piştgêriya Civata Erebî û Islamî dikirin û piraniya wan dewletan bi aliyê qirkirina Kurd û Kurdistanê dixistin.

Slogana parastina yekîtîya axa Sûriyê jî bûye exm ji Erdogan re, ji bo xwestekê wî jî ew xal car din di daxuyaniyê de bûye biryar. Ev Biryar ji bona Putîn ne xeme, ji ber ku li hemberî wê biryarê, bazarek li gel Tirkiyê û Iranê heye…

Li Civînê jî Rola milletê Kurd di cenga dijî tirorê jî ne anîne serziman û hatiye pûçkirin. Xwîna bîst hezar xort û Keçên me jî ne hêjayî ku weke cenga parastina Sûriyê ji tiror bêne bi navkirin. Lê, gotina tirorê bi Kurdan tê perçîm kirin.

Li gora dewletên Civînên Astana pêktînin û bi rêve dibin, Kurd ne layiqî beşdarbûnê ne, ne jî weke beşek ji milletê Sûryê tên naskirin.

Para milletê Kurd li Sûriyê di civîn û kongrên Astana ji destpêkê de ji Sala 2017 ta îro, tinebû û Îro jî nîne.

Ka hêzên Kurdan çi dibêjin ? Pîlana wan çiye ?

Emrîkaya yekbûyî piştî 31 Salan tiliya xwe ji Kabûl kişand û hêzên hûkûmeta Kabûl bê pişt hîşt û di nav Leppên Talîban berdan.

Ka gelo, ta kengî wê ew çend sed Çekhilgirtiyên Emrîka li Sûriyê bimînin ?

Îro, sibe…Heftiyek… Heyvekî din ?

Dûr be, nêzîk be wê her biçin, Tirkiyê – tevî Zordariyên wê li dijî dewlet û milletên Sûriyê, Îraqê, Libya, Misir… her Pîlanên xwe li herêmê chibicih tîne û cîhanê li wan bûyeran xwe ker û kûr kiriye.

Ji bo milletê Kurd li Sûriyê, rêya pîlana yên hêz û Partiyên Kurdan ji bo vê rojê re çiye ?

# Zêtûnên çavlirê

**Osma Îso**



Bihara ku dest di bustuyê erdê re dibir û ramûsanên xwe yên rengareng tûmtûmî laşê wê belav dikirin û sîng û berê wê bi kulîlên xunavî fodil dikirin û tilî bi bêhna mişt hêvî, kenê zarokan û awazên çûkan hene dikirin, çivîkên ku bi hev re di hembêza lêvên daran de û di bin siya mijangên pelan de hêlînên xwe ava dikirin, ji nişke ve bihar darivî û di hembêza tariyê de hilweşî û di pişt re zivistaneke lêvtiromî, benzkurbayî basikên xwe li aso lihev xistin û xêr û bêr li xelkê barandin û kevir û kuçik li me barandin ....û lorandina dûrbûnê dest pê kir...

Pêşeng xemgîn e û xuyaye cengek di serî wî de digere bapîrê Pêşeng digot: (Ev lawa yekî mizeret û pir çeled e).

Pêşeng û Azêd ji dibistanê vedigerîn mala xwe ya demkî; dibistan çadireke fereh bû bi wêneyên Efrîn û pakrewanan hatibû xemlandin, mamoste jî wan re digot: Divê armanc û silogana we ya sereke ev be: Li her derê û di her demê de Xwandin

Bê xwandin jiyan, pêşeroj tarî ye)

Pêşeng dibêje:

Adaz tu dixwazî tevlî êrişên min bibî?

Azad çavbeloq dibe matmayî dimîne û Pêşeng têdigihîne çima, lewra dibêje:

Qurban pir dûr mere, em hîn zarok in û wek mamosteyê me gotiye em pênûs in û tiving ji bo rizgarkirinê û pênûs ji bo avakirinê ...Azado!

Êvar bi êvar ez derbendan dibirim û di nav zinar û rişliqan re xwe berdidim nav erdên me û paşila xwe û tûrekî bi qasî ez kanim mişt zêtûn dikim û vedigerim, tu dixwazî tev min herî?

Ax axa me ye û zêtûn zêtûnê me ne lê dem bênamûs e, dihêle ku em mîna dizan herne nav zêtûnên xwe, azad nikane serbest bersiva xwe bide û dibêje:

Tu rewşa bavê min baş zanî, balafiran lingên wî birîn û dayîka min nikanê bi tenê xizmet ke... Pêşeng serî xwe bi kenekî çavxinan dihejîne... Azêd zanîbû ku ew ken tê wateya: (Tu tirsonekî)

Axafin ta ber deriyê mala demkî hate birîn û xatirê xwe ji hev xastin lê Xwedê zane Pêşeng çi agir di hundirê hişê Azêd de vêxist, Pêşeng çîkek avêt û pirêzeyên bîraninan ta di sê rojan di hişê Azêd de hêgin dibûn ...dihate bîra wî kernevala mûsima zêtûtan û çawa dengê dîkê



sibê hembêz dikirin û bi şev re çiwalên zêtûtan li bin balkonê rêz dikirin û çawa di ser çiwalan re hildiperikî ser xanî û dadigerî û bavê wî digot:

Bes sekin wek kûnsorkan di çiwalan re hildikşe...

Û carne azar dikir û digot:

Qurban raweste Xwedê neke îşek were serî te ma ne emê ji dest pitpita dayîka ji va gundî barkin, serî min vehesîne bila va meha pîroz siwe di ser me re derbas bibe.

Di nav ramanan de Azêd got:

Çima ez jî narim paşilek zêtûn ji dayîka xwe re naynim? Ma ne ew tim dibêje:

Zêtûnên kirînê bê ta›em û çêj in û min bêrya zêtûnên me kirî ye.

û di pişt re çavên xwe bi şerbê paqij dike û dibêje:

Pêşiyek kete çavên min

Azad di ber bîranînan re xew dike û roja din zû şiyar dibe sifra xwe bixwe datîne bi lez nên dixwe û dere dibistanê û li ser danê nîvro vedigere mal kardayînên xwe dinivîse û çi kar heye dike lê ew tim mijûl e, ta Pêşeng jî ew mijûlî mêze kir û vêre got: Çî heye di sê roj in tu ne liserhev î!

Lê Azêd tu bersiv nedida... Êvarê rêşiyên xwe berdan, Azêd mîna kerguhan xew kir û piştî orta şevê şiyar bû û ji kampê bi dûr ket û enî da gundê xwe û li rê siwar bû, derbend birîn, dunya kere, qurşînên çeteyan hin caran bi ewran de direwîn Azêd carna xwe dadixist carna xwe ra dikir carna li ser pozî pêçiyan dimeşî û her nêzîk dibû bêhneke ji xweşbûnê xweştir bi şanazî hildikşî poz... Ew gîha nav zêtûnan û di serî de dar hembêz kirin û pel ramûsandin ew hestyar bû ku dar xembar in û ji çavên zêtûnan hêstêr dibarin, ji dûr ve dengê seg û çeteyan dihat .

Azêd bi lez paşil û tûr ve mişt zêtûn kirin, ji gund dengê Xocê sibê hat û ew deng ji Azêd re bû zengilê metirsiyê... (Ro hindik maye wê hile)

Lêvên xwe ji pelan rizgar kirin û dîsa li hespê demê û riya vegerê siwar bû, lê xiştepiştekê xwe avête guhên wî , Azêd xwe li ser axê dirêş kir , bêhneke kûr kişand û tiliyên xwe berdan nav axê û mistek ax xiste berîka xwe, deng çû, bi kûnxuşkan derbend birîn û rabû ser pêyan û bi lez birê ket,careke din dengê çeteyan bilind bû û bang kirin, lê Azêd guh neda wan, çend tene zêtûn rijiyan lê Azêd bez berdewam kir, qurşîn barîn dîsa dengê seg, çete û qurşînan bilind bû,qurşîneke mîna sêmsoran bi milê Azêd dada û şewitand lê Azad bi dayîka ....

# Bila» Destê çepê haj ê rastê tune be, Ku çi rindiyê dike «.

Zamdarê Zindî

Xêr û rindî yek ji nirx û rewiştên mirovan e, û di civakê de bûne sinc û tîtal, çiqas civak bi nirxên rindiyê dewlemende be, ewqas mervan e û dilovan tê jimartin. Ev ton karên wiha bi civakê re dibe alîkar ku gelş û girêkên wê kêm bibin û bi heve were girêdan, dibe civakek dirust, giyanperwer û şaristan e.

Meriv bi hindikî dabeşî sê cureyan dibin.

1- Hin ji mervan di dest e hene, bê ku kes in din hajê hebin rindiyê dike, û mervaniya xwe din di hindirê xwe de vedişêre, ne kesê xêr lêbûye pê hay dike ku hest û vîna wî rêz digire û li serê wê/î nake minet, ew ji mervê dilovan û mervebilind û payebilind tê jimartin û ji wan gewreyên netewan bi der dikevin.

2- Hin jî hene xêr û bêr di destên wan de pir in, weke tê gotin « kunc ji pençê naweşin « ew kes weke kusî dikeve qavciqê xwe nikane jê bi der keve û mervaniya xwe bi kar wîne, û tim ji ber destê xizaniyê û tunebûnê dibase û dinale, û di xwe de dirame ku dê çawa sermiyanê xwe yê diravî li ser pişta yê giyanî mezin bike. Ezîtiya di hinava wî de li ustî digere û difetisîne, wî biçûk û bê nirx dike. Ew dijîn û dimirin, derin û tên



dinya yê bê ku tişt û şanekê li pê xwe bihêlin.

3- Cureyê sisiyê, yên herî bive û kêsbaz in û ji nirxan şûştî ne. Ew ger dewlemind bin an jî sîfîl bin. Gava firengek bidest dikevin hê nedayî tu kesî xizan li defê dixîne, û li ber mekrefonan û rûniştinan de dengê xwe bilind dikin û piropagendê ji xwe re çêdikin, û ew karê biçûk li ba wî mezin û gewre xuya dibe, û dibe bazirganê rindiyê û nirxan. Ezîtiya wî weke seriyê gênimê vala xwe di nav civakê de xwe hildide û pê şa dibe. Ew heyranê kesîtî, ezezî û berjewendiyên xwe ne, bi şev roj diramin ku çawa hilkişin ser êş û pêgerekiyên cîran, dost û gelên xwe ku xwe pê navdar bikin û sûda moralî û darayî jê werbigrin. Ew bi vî karê wiha merivantiya xwe der didin û li rex xwe radiwestin.

21.07.2021an

---

**Zêtûnên... Dûmahîk**

xwe diramî û wêneyên wê di pêş çavan re dibezîn,dît ew bi dilgermî zêtûtan pêşwazî dike piştî ku çîroka zêtûnan dibhîse û tene bi tene dişkîne û her çend rojan avê di ser re dirjîne û şêrîn dike û tenakê dixwe û dibêje: Mmmm xweş e ez bi qurban lawî xwe û van zêtûnan bim .

Qurşîneke dînok di paşilê re dere, lê Azad zêtûtan bernade û xwe davêje paş zinarekî, laşê wî diqerime, dengê seg û çeteyan û Xoceyê biyanî tê birîn, hêz xwe dike ku rabe, lê bêçare, pişta xwe dide zinêr û dibêje: Dayê li min biborîne min dixwast dilê te geş bikim û ez bê destûr ji we bi dûr ketim.

Tariya şevê vekşî, tîrêjên royê çavên Azêd yên vekirî xurandin lê Azad weke her car nekenî.

Ro matmayî ma û nizanîbû ku Azad raza ye lê hêşyar e!

30.3.2021 an

---

**Serokê Kurdê... Dûmahîk**

bû, dixwestin kurdên misilman û kurdên êzîdî ji hev cuda bikin û ev polîtîka îro jî berdewam e: “Digotin; ‘Êzîdî ne kurd in!’ Ji ber ku digotin; ‘Em kurd in’, kirin ku gelek rewşenbîr, zimanzan, nivîskarên kurdên me yên Êzîdî terka Ermenistanê bikin. Dewletê bi riya şêx û pîrên Êzîdiyan zilm û neheqî li wan kir. Semendê Siyabend, Şekiroyê Xudo Mihoyî, Karlanê Çaçan, Mîroyê Esed, Çerkezê Reş, Tîtalê Efo, Şerefê Eşîr, Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl. Tevahiya van navan digotin; ‘Em Kurd in’, lê Ermeniyan şêx û pîran sor dikirin ku li dijî wan bikin şer. Dikirin jî. Digotin; ‘We miletê xwe firotiye!’ Bi ser de jî li Karlanê Çaçan û Çerkezê Reş xistibûn. Ez bixwe li wir bûm. Ev lîstika Ermeniyan bû. Dixwestin tifaqa kurdan perçe bikin. Ermenî niha tiştekî wiha xistine nav Êzîdiyên me. Ji wan re dibêjin; ‘Nebêjin zimanê me Kurdî ye, bibêjin Êzdikî ye’ Radyoya Kurdî heye. Radyo vekirin bi navê Radyoya Êzîdiyan nemeşiya, rojname derxistin nemeşiya. Nameşe jî! Gava digotin; ‘Zimanê me Êzdikî ye’ jî bi Kurdî digotin! Ez bixwe 43 salan di nav kurdên me yên Êzdî de mame. Piraniya heval û hogirên min Kurdên Êzdî bûne. 43 salan min negotiye; ‘tu Êzîdî yî’ wan negotiye ‘tu misilman î.’ Em diçûne malên hev, me nanê hev dixwar. Kurdayetî îro behrek e. Di wê behrê de Êzîdî jî, zaza jî, Goran jî, Soran jî, Behdînî jî di hûndirê wê behrê de ne. Gelo tu dikarî ji behrê, ava çeman cuda bikî? Nikarî! Tu sax û ez silamet...»

------------

***salihkevirbiri@hotmail.com***

***Riataza.com***

# Serokê Kurdên Kazaxistanê (Berbang) Prof. Dr. Kinyazê Îbrahîm ...

## Cihê te bihuşt be!



Roja Yekşembê 08.08.2021, piştî 20 rojan ku bi nexweşiya Covid-19 ketibû, li Alma Atayê çû ber dilovaniya Xwedê.

Prof. Dr. Kinyazê Îbrahîm, rojhilatnas û akademîsyen. Serokê Kurdên Kazakistanê û li Zanîngeha Abaya Alma Atayê Serokê Navenda Zimanên Dinyayê bû, sala 1947an li Ermenistanê hatibû dinê. Kinyazê Îbrahîm xwediyê gelek xelatên neteweyî ye. Bi 6 zimanan dizane. Nêzîkî 20 kitêb li pirtûkxaneya Kurdî zêde kiriye.

Di hevpeyvîneke xwe de, li ser sitema ku li Kurdê Misilman bûye bi birêz Salihê kevibirî re, Gorbuhişt Kinyaz dibêje: «…19891990-, Şerê Qerebaxê. Azerî û Ermenî hev dixwin! Kinyazê Îbrahîm dibêje ku şer mala kurdan jî mîrat kiriye: “Kurdên me –xasma jî kurdên me yên misilman-rastî êş û azareke mezin hatin. Ji neçarî li seranserê Sovyetê belav bûn. Hinek ji wan çûn Sîbîrya û Yaqûtskê, beşek ji wan çûn Rûsya û derdora wê, qismek ji wan hatin Kazakistan, Qirgizîstan û Ozbekistanê. Ev nefîkirin ne wekî nefîkirina 1937’an û 1944’an bû. Ermenî bi darê zorê digotin; ‘ji nav me derkevin herin. Ermenîstan axa Ermeniyan e!’ Di dema Sovyetê de ji bavê kî zêde bû wisa bigota? Sovyet çavê wan derdixist!”

Kinyazê Îbrahîm dibêje ku ev polîtîkaya dewleta Ermenistanê ..... 11

# Zanyarê Kurdê navdar Prof.Dr Nadir Nadirov Koça dawî kir



Di 81 saliya xwe de, li Almata Kazaxistanê, piştî kêferateke bêtir ji mehekê bi nexweşiyê re, roja 24.08.2021, zanyarê Kurd ê mezin Nadir Nadirov ê ku li ser asta cîhanê naskirî ye, koça dawî kir.

Sala 1932an, li herêma Nexçîvanê ya Azerbêcanê ew jidayik bûye û di yeksaliya xwe de, ango sala 1933an, digel malbatê ew sergonî Kazaxistanê dibe.

Nadir Nadirovê jêr û jêhatî bi dilekî germ û hişekî vekirî dest bi xwendinê dike û bi pileyên zanistê ve hildikişe. Xwendina Zanîngehê bidawî dike û dibe Profesor. Li sala 1992an, bi belgeyan, ew sergonkirina Kurdan ya di salên 19301940- de hatine pê ji raya giştî re aşkere kiriye, û ji sala 2010an ve, ew bûye şêwirmendê serokomarê Kazaxistanê.

***Bi navê Desteya NEWROZ, em serxweşiya malbat, xwedî, kes û karên wî, û gelê Kurd bi tevayî dikin û cihê wî bihuşt be.***

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**